



Bernhard-Weiß-Str. 6  
10178 Berlin-Mitte

[www.berlin.de/sen/bjf](http://www.berlin.de/sen/bjf)

Senatsverwaltung für Bildung, Jugend und Familie ■ Bernhard-Weiß-Str. 6 ■ D-10178 Berlin

[www.berlin.de/sen/bjf](http://www.berlin.de/sen/bjf)

**Ji bo dêûbavên, zarokên  
wan diçin kreşên Berlinê**

16.02.2021

**Agahiyên ji bo dêûbavan li ser berfirehkirina lîstikên acîl a zarokan a piştî 22.02.2021an**

Dêûbavên hêja, stî û mîrzayên rêzdar,

Senatoya Berlinê di 11.02.2021an de biryar stand, ku di rêbazên derbasdar ên Rêzîknameya Tedbîrên Parastina ji Enfeksiyonê de ku ji 25.01.2021an ve pêk tên hîç guherîn çênebe.

Navendên lîstikên zarokan a danê rojê û çiyên lîstikên zarokan a danê rojê jî di vê rewşê de girtî dimînin û di demên pêş de jî berdewamî xizmeta lîstikên zarokan a acîl didin.

Zehmetiyên mezin ên malbatên Berlinê li ber çavan tên girtin, ji ber vê yekê divê rêbazên di derbarê sûdgirtina ji lîstikên zarokan a acîl piştî 22.02.2021an werin berfirehkirin.

Zêdetirîn hejmara bikaranîna mafê lîstikên acîl a zarokan a li navendên lîstikên zarokan a danê rojê de piştî 22.02.2021an ji sedî 50 bilind bibiye û bibe ji sedî 60ê kapasîteya navendê, ku li gorî hevpeymanê hatiye diyarkirin.

Şertên niha derbas dibin, ku ji bo sûdgirtina ji mafê lîstikên acîl a zarokan in, di vê rewşê de piştî niha jî bi gelemperî wekî xwe dimînin. Piştî 22.02.2021an li gel zarokên pêdiviyeye wan a awarte û acîl a ji bo lîstikên zarokan heye û derfeteke din a lîstikên wan tune ye, her wisa zarokên din jî dikarin sûdê ji lîstikên zarokan bigirin, ango zarokên di demeke nêz de dest bi dibistanê dikin, çûna wan a dibistanê salek paş ve hatiye xistin an jî pêdiviya wan bi piştgiriya zimên heye. Wextê pêşiya çûna dibistanê û her wisa pêdiviya bi piştgiriya zimên jî di vê çarçoweyê de wekî sedemên taybet ên perwerdehiyê yên ji bo sûdgirtina ji mafê lîstikên acîl a zarokan tên qebûl kirin.

Ji kerema xwe re di derbarê bikaranîna mafê lînêrîna acîl a zarokan de hûn bi navenda hêlîna xwe re rasterast pêwendî deynin.

**Ji bo zelalkirina pirsên di derbarê mafdariya li ser lînêrîna acîl a zarokan xeta telefona acîl a dêûbavan a Rêveberiya Senatoya Perwerdehî, Ciwan û Malbatan bi berdewamî di xizmeta we de ye. Hûn dikarin bi vê hejmarê 030 - 90227 6600 di tevahiya rojên xebatê de ji 9an hete 15an xwe bigihîninê.**

Li gel silavên germ

Peywirdar

Holger Schulze

Rêveberê Daîreya Malbat û Perwerdehiya Zarokên Biçûk